Krîza Sûriyeyê, bi dirêjahiya heşt salan di çend qonaxan re derbas bû. Tu şirovegerên siyasî pêşbînî nedikir ku ev krîz wiha dirêj bike. Heya roja îroj jî kesek nizane ka şewazê çareseriyê dawî ya vê krîza gerînok dê bi çi awayî be.

Dijberbûna ajînde û berjewendiyên dewletên ku ji destpêkê ve destêwerdan di bûyerên hundirê Sûriyeyê de kiribûn, hêla ku ev krîz wisa dirêj bike. Em dikarin bibêjin ku şerêkî bi wekalet di hundirê Sûriyeyê de diqewime, ev şer jî bi rengê xwe yê leşkerî ber bi dûmahîkê ve diçe.

Guhertina herî mezin di pêvajoya krîza Sûriyeyê de ji Kongreyê Asîtanayê dest pê kir, piştî ku Rûsya bi hemû giraniya xwe daket meydana Sûriyeyê û hevserîyê hêzê di navbera rêjîm û rikberiyê de da guhertin. Armanca sereke ya Asîtanayê ew bû ku hêzên îslama radikal ên bi ser rikberiyê (îtilaf) ve û ji aliyê Tirkîyê ve tene destekdayîn, ji nav bibe.

Gelek bazar û girêbest di navbera Rûsya, Tirkîyê û Îranê de bi rêya danûstandinên Asîtanayê hatin girêdan, hin ji wan hatin ragihandin û hin jî veşertî man.

Du encamên sereke ji danûstandinên Asîtanayê derketin hole; yek jê jî navbirina hêzên teror û radikal li deverên berfireh ji Sûriyeyê ye û vegerandina desthilatdariya dewletê li wan deveran, ya din kêmkirin û lawazkirina rola Tirkîyê di krîza Sûriyeyê de ye, nemaze piştî daxwaza Rûsya ji Tirkîyê ku divê di dema mehekê de ji Idlibê vekêşe.

Bi dîtina min, destêwerdana Rûsya di dosyaya Sûrî de ji destpêkê ve bi ronahiyeke kesk û rêdaneke veşertî ji aliyê Amerîkayê ve bû, ev yek li ser

zimanê berpirsekî amerîkî hat tekez- kirin, dema ku got: "Hevalbendê me yê herî zêde em jê bawer li Sûriyeyê, Putîn e." Destêwerdana Rûsya bi rengêkî yekser û aktîv piştî wê yekê hat ku hêza grûpên îslama radikal gihişt asteke ku êdî metirsi hebû dest deynin ser desthilatdariya Sûriyeyê. Eger "Ixwan El-Muslimîn" û hêzên çekdar ên bi ser wê ve desthilatdariya Sûriyeyê zêft bikira, rola Tirkîyê û Qeterê dê di Sûriyeyê de bi hêz bibûya. Bê guman ev yekê dê berjewendiyê Amerîka li Rojhilata Navîn bixiştê di bin gefê de; ji lew re Amerîka rola jînavbirina wan grûpan sipart Rûsya, bê ku bi şewazekî eşkere têkildarî siyaseta Rûsya li Sûriyeyê bibe.

Hebûna hêzên terorîst ên wekî Cebhet El-Nusra di nava refên rikberiyê Sûrî de rewati da Rûsya ku şerê wan bike û hêzên îslama radikal ên ku rikberiyê Sûrî -bi taybet "Ixwan El-Muslimîn"- hêviyên xwe bi wan ve girê dabûn, ji tevahiya Sûriyeyê biqewitîne. Êdî ji bilî Idlib û çend deverên bakurê Sûriyeyê, tiştêk di destên rikberiyê îslamî de nema. Em pêşbîn dikin ku di demê nêz de ew dever jî û di nav wan de Efrîna ku bû qurban bazarên Asîtanayê, ji wan çeteyan bêne paqijkirin. Di bin fişarên rûs û amerîkîyan de, Tirkîyê dê neçar be ku ji Sûriyeyê derkeve û dest jî çeteyan berde.

Li gorî ku em dişopînin, diyar e ku planeke hevbeş di navbera Rûsya û Amerîkayê de ji bo bidawîkirina krîza Sûriyeyê û peydakirin çareseriyekê heye, ev plan dikeve xizmeta rewatiya hebûna wan ji bo ku karibin demê dirêj li Sûriyeyê bimînin, ev plan her wiha berjewendiyên wan li



Imran Yûsiv

deverê diparêze.

Yek ji rêbazên wê planê: Baskokirina tirk û îraniyan û tunekirina rola wan li Sûriyeyê ye.

Der barê Rojavayê Kurdistanê û deverên bakurê Sûriyeyê yê ku di bin destên hêzên HSDê de ne, çarenûsa wan girêdayî rêkeftineke amerîkî-rûsî ye. Ev danûstandinên ku di navbera Rêveberiya Xweser û hikûmeta Sûriyeyê de dibin, bi dîtina min yek ji encamên hevdiîna Trump û Putîn a dawî ye. Armanca van danûstandinan, rewakirina Rêveberiya Xweser e, ew jî bi rêya danpêdana Şamê bi vî rêveberiyê ye li gorî destûra heyî, yan jî bi rengê demkî heya ku destûr bête guhertin. Ji aliyekî din ve, ev danûstandin rê li ber destêwerdana Tirkîyê û gefên wê li ser kurdan û deverên ku li jêr kontrola HSDê ne, digire.

Bi giştî, biryara paşeroja Sûriyeyê di destên Amerîka û Rûsya de maye. Piştî lawazkirina rola Tirkîyê û Îranê û tunekirina wê rolê li Sûriyeyê, dibe ku Sûrî ber bi dewleteke nenavendî ve biçê û Rojavayê Kurdistanê û kurd ber bi Rêveberiya Xweser, wek hukmekî etonomî yan jî nimûneyeke mîna ya Başûrî Kurdistanê ve biçin.

Yekîtiyê Bide Min... Ez ê Kurdistanê Bidim Te

Di sala 1639'an de dema ku cara yekemîn Kurdistan di navbera tirkên osmanî û farîsên sefawî de hat dupeşkirin (li gor peymanê rûş û bedyom ya bi navê Qesira Şêrin), hingê zanyar û rewşenbîrê kurd, her wiha bavê razber ê neteweyê kurd "Ehmedê Xanî" bi gotinekê li ser wê peymanê navborî, bêzarî û nerazîbûnên xwe bi dilekî tije kovan da diyarkirin û hasên xwe wiha anîn ziman: "Eger peymanê 'Qesira Şêrin' ji ava Zemzemê be, ez wê avê qet venaxwim." Zanyarê kurd Ehmedê Xanî dema ku qelsî û nebesiyên civaka kurdî tîne ziman, careke din bi dilekî hesret wiha dibêje: "Rêveberiyê rêzan di nava kurdan de bihata peydakirin, hingê min ê karîba aleya kurdî li ser piştê hemî cihanê bida daçikandin." Di heman çarçoveyê de ramangerê kurd Ebdullah Ocelan der barê hevî û xweziyên Ehmedê Xanî de ji bo avakirin û peydakirina pêşengiyê rêzan û birewer, weke bersivdayîn ji bo Ehmedê Xanî wisa dibêje: "Ew pêşengiya ku ji hêla Ehmedê Xanî ve ji bo kurdan dihat xweştin ku di hizir û bîra xwe de her dem jîyan dikir, îro em hewil didin wê rêbertiya ku Ehmedê Xanî dixwest bidin avakirin." Lê mixabin yekbûn û yekrêziya neteweyê kurd, weke hesret û birîneke kûr di dilê gelek zana û rewşenbîran de ma û bi wan re koça dawîn kir. Di heman mijarê de, pêwîst e peyva kesayet

û nivîskara kurd Rewşen Bedirxan (hevjîna afrînerê alfabeja kurdî Mîr Celadet Bedirxan) neyê jîbîrkirin; berî ku biçê ber dilovaniya Xwedê, ji bo yekîtiya gelê kurd, gelek caran ji mêvanên xwe re dema ku seredana wê dikirin, dihevot û digot: "Yekîtiya kurd bide min, ez ê Kurdistanê bidim te." Lê careke din mixabin, weke me anî ziman, di çarçoveya gotinê de berî niha hemî hewildan û planên ku ji bo lidarxistin û dabeştina kongreyêke neteweyî ya giştî li ser asta her çar parçeyên Kurdistanê, têk çûn. Lê di heman demê de ev yek nayê wateya ku em wekî rewşenbîr bi behêviyê re rû bi rû bimînin û bi behanyên cûr bi cûr xwe mijûl bikin û di derencamê de bi erkên xwe yê dîrokî (xizmet û palpiştîya gel) ranebin.

Wekî ku em hemî dizanin, tevgera siyasî ya kurd li çar milên Kurdistanê heta niha nikaribû ewê xewn û xeyala netewî pêk bîne. Lewra wekî pêngava yekemîn ji hêla rewşenbîrên Kantona Cizîrê ve, pêwîst e kongreyêke kurdî ya niştimanî, li ser hemî partî, rêxistin, kesayetên niştimanperwer ên serbixwe û hemî aliyên siyasî, li ser asta Rojavayê Kurdistanê were pêşniyarkirin. Em weke Yekîtiya Rewşenbîrên Kantona Cizîrê, vî projeyê pêşniyar dikin û em dizanin ku di serî de pêwîstî bi lidarxistina kongreyêke kurdî ya niştimanî heye. Bi vî awayî, dema ku ev projeyê pêk were, demajoyêke bingehîn bi



Pêşeroj Cewherî

xwe re diafrîne, belê ji bo siberoja kurdîstanî dibe minak û bîncîne. Her wisa di vî çarçoveyê de her tişt dikeve xizmeta avakirina demajoya dawî, demajoya xewna gelê kurd. Îro dema ku em weke rewşenbîrên Amûdê ve yekê li hemû partî, rêxistin û kesayetên civakî yê welatparêz û serbixwe pêşniyar dikin, bê guman dê di çarçoveyêke destnîşankirî de be, bo nimûne; pirsên ku ji hemû aliyên werin kirin, dê bi vî şeweyê dahatî bin:

1- Gelo hûn ji bo kongreyê kurdî ya niştimanî ku li ser asta Rojavayê kurdîstanê were lidarxistin, amade ne?
2- Em weke rewşenbîrên Kantona Cizîrê (Şaxê Amûdê) dixwazin pêşekî, ji bo girtina nêrînan, seredana hemî aliyan bikin.
3- Şaxê Amûdê li ser navê Yekîtiya Rewşenbîrên Kantona Cizîrê, dê hemî aliyên pêwendîdar bide vaxewndin û her wiha di vî çarçoveyê de dê amûra hevrezîyê be.

Çi Girîngiya Danûstandinê Li Gel Şamê Heye?

Li ser vaxewndina hikûmeta Sûriyeyê, di dawîya tirmehê de şandeyeke Meclisa Sûriyeya Demokratîk (MSD) bi serokatîya Seroka Desteya Rêveberî a meclîsa navborî "Ilham Ehmed", ji bo danûstandinê li gel hikûmetê, seredana Şama paytext kir.

Çavên her kesî li derencamên pêşîn ên danûstandinên di navbera şandeya MSDê û hikûmeta Şamê de ne.

Tevlî ku ev danûstandin bi guman in jî, lê ji bilî lihevkerîne, tu bijardeyêke din ji bo çareseriyê tune. Ev yek jî di daxuyaniyên Serokê Sûriyeyê Beşar El-Esed der barê herêmên kurdî de diyar dibe; ji ber ku ji berî demê Esed gotibû ku tenê du rê li pêşîya kurdan in: An divê em diyalogê bi hev re bikin, an jî şer.

Bê guman rêya tekane ji bo çareseriyê "danûstandin" e. Lê heta niha jî hikûmeta Sûriyeyê tu projeyê ji bo bidawîkirina wê bobelatê nedaye ber xwe, her wiha welatên zilhez ên mîna: Rûsya, Amerîka, Tirkîyê û Îranê jî li ser vekîşandina hêzên xwe û milîsên biyanî jî herêmê, negihane rêkeftinekê.

Di dema îro de, hikûmeta Sûriyeyê bi

bijardeya leşkerî nêzikî aliyan dijberî xwe dibe. Herêm, di navbera Rûsya û komikên bi ser Îranê ve ji aliyekî ve û di navbera Amerîka û hevlabendên wê (HSD) û hêzên kurdî yê rojhilata Çemê Feratê ji aliyekê din ve, biparvekirî ye.

Hêzên kurdî zêdetir ji rêjeya 30% ji xaka Sûrî rizgar kiriye ku anih ew deverên rizgarkirî li jêr kontrola wan in. Lê her kes dipirse: Gelo ev herêmên li jêr serweriya HSDê, di siberojê de, dê çarenûsa wan çi be, her wiha eger hat û rêkeftinek di navbera hikûmeta Şamê û Rêveberiya Xweser de pêk hat, dê şeweyê birêvebirina herêmê çawa be?

Ji bo bidestxistina mafên gelê kurd, ji bo me girîng e:

- 1- Danpêdaneke destûrî bi mafên netewî yê gelê kurd pêk were.
- 2- Zimanê kurdî di herêmên kurdî de yê sereke be.
- 3- Der barê herêmên Sûrî yê rizgarkirî de, divê rizgarkirina Efrînê di serê listeyê de be.
- 4- Divê şeweyê birêvebirina Rojavayê Kurdistanê ji "Rêveberiya Xweser" ne kêmtir be.
- 5- Rakirina hemû projeyên



Perwer Mîdî

nijadpêreştî sebarett bi bicihkirina erebên "xemer" û vegerandina mal û mulkan li xwediyan rasteqîn.

6- Dîtina çareseriyêke guncaw ji rewşa perwerdehiyê re li herêmên kurdî û bakurê Sûriyeyê.

7- Serastkirina rewşa xwendekarên zanîngehên Sûrî yê ku ji ber rewşa şerê li Sûriyeyê ji xwendinê bi dûr ketine.

8- Bipêşxistina asta xizmetguzariyan li herêmên Rojavayê Kurdistanê.

9- Peydakirina derfetên kar ji bo ciwanan, da ku xelk ji penaberiye vegere ser mulk û malên xwe.

10- Lêborîneke giştî ji bo rewşa leşkerî li herêmên li jêr kontrola HSDê de.

Tewfîqê Kurd Razayî Ye

Şoreş gotineke xweş e, dilxwaz û hezkerê wê pir in. Em dikarin bibêjin ku bi saya şoreşan hemû miletên cihanê ji zordarî, bindestî û hejariyê xelas bûn. Piraniya wan miletên ku şoreş li dar dixistin, niha xwedîwelat in, welatên wan pir bedew û pêşketî ne, belê min got; piraniya miletan, lê ne hemû miletên ku şoreş li dar xistin gihaştine armacên xwe, hin milet heta niha di bin zulm û zorê de dijîn, miletê kurd yek ji wan miletên ku hîn di bin zilmê de ye tev li ku bi sedan şoreş li dar xistin. Kurd ne tenê di zilmê de dijîn, belê bê welat û nasname ne jî. Der barê van şoreşan de divê kurd ji xwe bipirsîn: Ka çima dunya derbasî çerxa bişt û yekê bûye û em hîn bê maf û welat in? Pêşî me got: Şoreş gotineke xweş e, tenê berhemên şoreşên kurdan parçeyê duyem ji gotina "şoreş-reş" e; dixwazim bibêjim ku tenê "reş" bi dest kurdan ket.

Di baweriyê min de, ji ber ku şoreşên me tenê li ser asta leşkerî bûn. Jixwe em di qada cengê de pir zîrek in, lê em di qada zanîne de pir lawaz in, ji ber vî yekê tenê rengê reş bi dest me ket.

Bi serkeftinên leşkerî tenê, em nikarin bibêjin ku şoreş serkeftî ye, belê dibe ku serkeftinên bîrwerî û zaniştî peyda bibin, her wiha em nikarin bibêjin şoreş binkeftî ye bi binkeftinên leşkerî; nimûne zorçûyîna welatê Japonê di Cenga Cihanê ya Duyem de li hember Amerîkayê û alîgirên wê, lê îro roj Japon di warê zanîne de li pêş Amerîka ye, ne tenê li pêş wê ye,

belê kompanî û kargêhên amerîkî li gorî zanayî û zanyarên japonî bi rê ve diçin.

Xwînerên hêja, dizanim ku hûn ê bipirsîn: Ma dibe ku tu kurd û Japonê bidî ber hev?! Ji bo vî pirsê ez ê nêzik werim û xwe bispêrim ezmûna şoreşa Misirê, jixwe kurd û misirî tîkiliyên wan ên dîrokî baş kûr û dûr in. Ez pir dûr naçim û ez ê raşterast biçim serdema "nasirî" ku bi serkeftiya Cemal Ebdilnasir bû. Di wê demê de zana û rewşenbîrêkî pir gewre bi navê Tewfîq El-Hekîm xuya bû, Ebdilnasir digot: "Bavê pîrozê şoreşa Misirê: 'Tewfîq El-Hekîm' e." El-Hekîm bi rêya şano, gotar û pirtûkên xwe şoreşa misirî bi rê ve dibir. Hin dibêjin ku El-Hekîm çirûska şoreşê bû, ne tenê şoreş, belê siyaseta misirî bi tevahî. Ebdilnasir digot: "Dema ku bûyere li ser asta siyasî diqewimî, min helwesta xwe der barê wê bûyerê de zelal nedikir berî ku ez gotara El-Hekîm bixwînim û helwesta wî fêhm bikim ka El-Hekîm çi dibêje. Jixwe ew gotar bi rengêkî nerasterast wek nameyekê ji min re bû ku dibêje min bila helwesta te wisa be."

El-Hekîm di pirtûka xwe ya bi navê "El-Sultan El-Ha'ir - Şahê Sergeşte" de bi tundî şerê Ebdilnasir kir û piştî miletê xwe girt.

Gelek caran Ebdilnasir hevdiîna dixwest û dişand pey wî, lê El-Hekîm digot: "Raşt e Cemal Ebdilnasir hevalê min e, lê ew niha serok e û ez nivîskar im. Êdî ez hevalê miletê xwe me, karê min û wî bi hev tune. Jê re



Raman Seydo

bibêjin ku ez naxwazim wî bibînim, lê ew dizane ku helwestên min çi ne, ji xwe ez jê re dinivîsim."

El-Hekîm her wiha der barê vaxewndina Ebdilnasir de digot: "Ez ditirsim ku biçim bal Ebdilnasir û ez nêzî wî bibim û dûrî miletê xwe bîkevim. Jixwe bi kêr nayê ku nivîskar û rewşenbîr di bin baskên şah de bin, belê divê milên wan di bin milên milet de bin û xemxwarên milet bin, ne xemxwarên razîbûn û dilxweşkirina şah bin. Ebdilnasir şah e û miletê min hejar e, ka çawa herim wî bibînim!" Jixwe di destpêkê de min behsa ezmûna Japonê kir ku çawa projeyên aborî û teknolojî didan ber xwe û navên wan projeyan dikirin "xewn" û digotin ku heta deh salên pêş divê em filan "xewn"ê bibin serî, her çend salan xewnek didan pêşîya xwe.

Gelo ka xewnen me, ka projeyên me, çima em weke berxekî mîjo ku çî guhanê dikeve ber me em devên xwe diavejinê?

Baş e, em bê xewn in an em nizanin bixewinin? Gelo ka Tewfîq El-Hekîmê kurd ku me bixewinîne û xewnan bo me peyda bike?

Hunermend Mem Ararat: Di demên pêş de dixwazim romanê binivîsim...

Min muzîk hilnebijart; muzîkê ez hilbijartim.

Hunermendê rewşenbîr Mem Ararat ku karîbû di civata hunermendên kurd de rengê xweser û bilind ava bike, di hevpeyvîna ku Bûyerpressê pê re kiriye de, wiha kurteyekê ji jiyana xwe dibêje û xwe dide nasîn: “Ez di 17’ê îlona 1981’ê de li gundê Girkê Şêxê yê girêdayî Dêrika Çiyayê Mazî hatime dunyayê. Ji ber hin sedemên siyasî û pê re jî pirsgrîkên aborî, hêj zarok bûm, malbata min ji neçarî koçî rojavayê Tirkîyê kir. Ji ber vê yekê, min tenê dikarîbû çar salan dibistana seretayî bixwînim. Jixwe ew çar salên xwendinê jî li çar dibistanan derbas bûn; ji ber ku her çend mehan, malbata min ji neçarî koçî cihekê din dikir.

Pîştî 17 salan em li welat vegeriyan û ji wê çaxê û bi şûn de, li bajarê Qoserê dijîm. Çiroka min û muzîkê di temenekî gelekî biçûk de dest pê kiriye, lewma cara pêşîn kengî min dest bi gotina sitranan kiriye, nayê bîra min. Raşt e min di 16 saliya xwe de dest bi sazbandiyê kiriye, lê destbira tiya min û muzîkê çirokeke kevintir e. Ji ber vê yekê ez tim dibêjim: Min muzîk hilnebijart; muzîkê ez hilbijartim. Zaroktiya min bi koçberiyê derbas bû. Di destpêka sala 2014’an de, bi albûma “Quling Ewr û Baran” rêwîtiya min a muzîkê ya profesyonelî dest pê kir. Rêwîtiya min bi albûma “Kurdîka” -ku di destpêka sala 2016’an de derçûbû- dom kir. Albûma min a sêyemîn jî ku bi navê “Xewna Bajarekî” ye, di 25’ê firmeha 2018’an de derket.”

-Bi navê Rojnameya Bûyerpressê sipasiya cenabê te dikim ku te derfeta evê hevpeyvînê da me.
Zor sipas ji bo we jî, ji ber ku hûn ê dengê me bigihînin “Rojavayê Welat”.

- Di biwara deng, gotin û awazan de, şopeke te ya xweser heye. Te çawa karîbû evê şopê vekî û evî rengê cihê ava bikî?
Zor sipas ji bo we. Jixwe hemî mirov taybet in û her mirovek xwedî rengê cuda ye. Lê belê çerxeyên heyî, ji bo ku mirovan bikin yek reng û yek deng, bi hemî hêza xwe tédikoşin. Dibe ku ji bo wan, birêvebirina yek reng û yek dengî hêsantir be. Mixabin, piraniya caran bi ser jî dikevin. Li gorî min, dema ku mirov karibe bi baldarî li xwe û li derdora xwe guhdar bike, ew ê reng û dengê xwe binase û ji xwe re rêyekê veke. Çerxeyên perwerdehiyê yê wê serdemê mirovan basko dikin. Mixabin, mirovahî li ser mîrateke bixwîn rûniştîye. Dema ku mirov hêviya xwe bi keda xwe ve girê bide û destdirêjiyê li sermiyanê kesekî din neke, ew ê bikare li xwe hay bibe û her wiha dengê xwe bibihîze. Filozofê Elmanî Nietzsche jî gotiye: “Mîratxurî, xetereyê mezin e ji bo şexs.” Lewma ya herî baş keda dest e. Tenê keda mirov dikare azadiya mirov bide wî/wê.

- Ji hunermendên kurdan, bandora kê li te bûye û herî zêde li kê guhdar dikî?

Ew kesên ku ji bo huner û muzîka kurdî ked dane, ez bejna xwe li ber hemûyan ditewînim. Ji ber ku tiştê “xwebûna kurd” heta îro paraştîye: zarogin e, helbest e, sitran e; bi gelemperî huner e. Çandên domînant, bi piranî hêza xwe ji pêşketinên hunerî disitînin. Lewma çanda kurdî jî çandeke domînant e. Jixwe eger ne wisa ba, çanda kurdî dê di bin ew qas zextên piştaftinê de biheliya û biçûya. Ji Hesên Zîrek heta bi denbêj Şakiro, Zahiyo, Mihemed Şêxo û heta bi Mihemed Arif, Tehsîn Taha, Kerapête Xaço, Elî Merdan, Îsa Berwarî, Faris, Aram Tigran, Siyabend, Hozan Serhed, Meyrem Xan, Hesên Cizîrî, Kawîs Axa, hunermendên radyoya Êrîvanê, Miradê Kinê, Dilgeş, Eyşe Şan, Koma Berxwedan, Koma Cûdî, Ayaz Yûsiv, Erdewan Zaxoyî, Nîzamettîn Arîç, Seîd Yûsiv, Koma Amed, Birader, Rotînda, Koma Dengê Azadî, Metîn Kemal Kahraman, Şahram Nazerî, Tara Jaff, Kamkaran, Mehmet Atlî, Ciwan Haco, Xalîl Tarî, Kerem Sevîç, Hivron û hwd... Ev lişte dikare dirêjtir bibe, min li hemûyan guhdar kiriyê û dikim.

- Bi behaneyê moderniyê, di

roja îroyîn de sitranin tén pêşkêşkirin ku bi yek carê ji kurdiyê şûstî ne. Hunereke nûjen û xwerû kurdî, çawa dikare bi dest bikeve?

Li gorî min, dema ku mirov bi dilgermî tevbigere -bi çi şeweyî bike bila bike- ew ê nikaribe hunera xwe ji nixên xwe yê şexsî bişo. Lewma em jiyane di xwebûna xwe re derbas dikin û fêrî jiyê dibin. Her kes di paçeya xwe re li dunyayê dinêre. Ew kesên kurd ên ku bi behaneyê moderniyê giyanê sitranê şolî dikin, bê guman sedema wê ne modernî ye, dibe ku ew dixwazî bişibin hinên din. Yanî dibe ku ji xwe direvin. Jixwe ji ber vê yekê jî berhemên wisa dê bi kêrî tiştêkî neyên. Lewma di hunerê de dilgermî (samîmiyet) pêwîst e. Li gorî min, hunermend kedkarên heşt û wateyê ne. Helbet pêkan e ku mirov bi şeweyekî modern muzîka kurdî bike. Jixwe divê hunermend ji derfetên modern sûtê jî wergirin. Ji ber ku dunya tevli şert û mercên xwe her diguhere û divê kurd jî xwe li gorî bipêşveçûnan ji nû ve saz bikin. Heta mirov dikare vê jî bipirse: Gelo çima kurd pêşengtiya vê nekin? Tevlî kurdbûna xwe, mirov dikare pêşengtiya vê yekê bike helbet. Ev pêkan e. Lê belê divê mirov rêzê jî raborî û folklorê xwe re jî bigire û qîmetekî nîşan bide. Divê ku rêbaza modern nebe navgîneke înkarkirina raboriyê.

- Zargotina kurdî di milê hunerî de gencîneyeke dewlemend û dagirtî ye. Dariştina hunereke nûjen ji hemanên evê gencîneyê, ta çi astê pêkan e?
Li gorî min hunermendên kurd di vê mijarê de gelekî bişens in. Ji ber ku ev gencîne di binhişê me de giyanê me dewlemend dîke û mixabin gelek caran haya me jî ji vê yekê çênabe. Her mirovek li ser bîngehekê mezin dibe û dema ku diçe ser dilovaniya Xwedê tevli wê bîngehê dibe û ji bo nîşên nû dibe bîngeh. Ev yek dikare “pey-xam bide” jî bo tiştên nû û nûjen jî. Her wiha hunermend dikare vê gencîneyê li gorî demê, ji nû ve şîrove bikin. Li gorî min, encax bi vî awayî kurd dikarin raboriya xwe ji windabûnê xelas bikin. Ev yek bi taybetî jî ji bo kurdan pêwîst e; ji ber ku dema kurdê xizneyê tevli dema nû nekin, an ew ê bê jîbîrkirin û wînda bibe, yan jî ji hêla neteweyên din ve ew ê bê piştaftin û ji hêla dewletên serdest ve were şelandin.

- Hunera te xwerû kurdî ye yan jî behneke biyan jê tê?
Mirov dişibe tevahiya erdnîgariyên ku tê de jiyaye, her wiha bandora hemî şert û merc û

serdemên jiyane lê bûye. Ew tiştê ku em destên xwe didinê, ew axa ku em pê lê dikin, rengê xwe dide me û hinekî jî rengê me jî disitîne. Mirov ta radeyekê dişibe cînarên xwe jî. Giyanewer û bireser, reng didin hevûdin. Wekî encam; em hemû mirov in û em zindî ne. Mem Ararat, bê guman gelek rengên din jî di xwe de hil-digire, lê helbet ew kurd e û bi vê yekê jî serbilind e.

Ez kurdekî bişens im, ji ber ku ez hêj xewnên xwe bi kurdî dibînim.

- Di axaftin û hevpeyvînê de, tu xwediyê kurdiyê zelal û sîpêhî yî. Tu çawa hînî evê kurdiyê bûyî û hunermendekî ku sitranên xwe bi kurdî dibêje û bi zimanekî din diaxive, tu çawa lê dimihêrî?
Zor sipas ji bo we. Ziman wekî mirovan dijî; mezin dibe, diguhere û dema ku kesek pê neaxive, dimire jî. Li gorî min, divê mirov hinekî kedê bide zimanê xwe. Lewma ziman deriyê giyanê mirov e, pira di navbera mirovan



de ye. Ew pira han çi qasî zexm û bedew be, ew qasî tēkilî xweş û bedew dibe, her wiha vegotin û derbirin jî ew qasî hêsan dibin. Xwezîya min bi wan kesên ku qîmetê didin zimanê xwe û zimanê xwe pak û bedew dikin. Lewma heta mirov zimanê xwe yê dayîkê baş neaxive, nikare bi hêsanî fêrî zimanekî din jî bibe. Li gorî min, dema ku mirov bi zimanekî sitran gotin, bi zimanekî helbest nivîsîn, divê wî zimanî baş bizane û pê biaxive. Ji ber ku li pişt her zimanekî, çand û dîrokek heye. Ger mirov nizanibe jî, divê fêr bibe. Ji ber ku berevajiyê wê yekê tê wateya ku

Hevpeyvîn: Ferîd Mîtan

mîrov rêzê jî xebata xwe re nagire û tu hurmetê nade wan kesên ku hunera xwe pêşkêşî wan dike. Gelo ma dibe bijîşkek bi literatûreyê tendurîstiyê nizanibe? Gelek kes hene ku bi eslê xwe kurd in lê belê ne muzîkjenên kurdan in, ji ber ku bi zimanên din muzîk çêkirine. Helbet mirov nikare wan kesan bi temamî mehkûm bike, ji ber ku kurd raştî piştaftine-ke gelekî tund hatine û di encamê de ev hilbijartineke şexsî ye jî. Lê belê dema mirov biryar da ku bi zimanekî hunerê bike, fêrbûna wî zimanî dibe peywira wî/wê. Li gorî min, ew kesên ku rêzê jî karê xwe re digirin, vê yekê pêk tînin. Ez kurdekî bişens im, ji ber ku ez hêj xewnên xwe bi kurdî dibînim. Malbata min her bi kurdî diaxivî. Bavê min nedixwest em di nav malê de ji bilî kurdî bi tu zimanên din biaxivin. Jixwe dayîka min hêj jî bi tirkî nizane. Ez bi xwe jî li dibistanê fêrî tirkî bûm. Di warê ziman de, heta min karîbû, min xwe perwerde kir. Heta ji min hat, min ked da zimanê xwe.



dişibin hev.

- Ji bo demên bê, çi projeyên te hene?

Pîştî derçûna vê albûmê (Xewna Bajarekî), em ê dest bi xebata albûmeke nû bikin. Dixwazim ji çar hêlên Kurdistanê sitranan bixwînim. Dixwazim albûmeke ku ji tevahiya welatê rengên xwe digire, saz bikim. Piştê em ê rêwîtiya xwe bidomînin. Di tûrikê me de hêj çend gotin hene, ger temen têrê bike, em ê bi dost û hevalên xwe re bi par ve bikin. Di demên pêş de ez dixwazim li ser helbestê jî bixebitîm û ceribandî û romanê jî binivîsim. Çend fikir û projeyên me hene, bi hêvî me biçin serî.

Rojavayê welat ji bo min hêviyê mezin e.

- Di roja îroyîn de Mem Ararat li Rojavayê Kurdistanê sitereke geş e. Tu ji guhdar û evîndarên

sitrane xwe bi hev re bibêjin. Xwezî bi wê rojê ku em karibin li Qamişloyê, li Kobanê û li Efrînê; li Mahabad, Êrmiye û Kirmanşanê; li Hewlêr û Silêmaniyê û li her çar hêlên welat sitranên xwe bixwînin. Ez bi hêvî me ku berî mirinekê ev derfet çêbibe. Heger ev yek pêk neyê û ez bimirim, çavên min dê vekirî biçin.

Rojava ne tenê ya rojavayîyan e; çavên hemû kurdan li Rojavayê ye.

- Li gorî nêzîkbûn û şopandîna te, tu tevgera hunerê li Rojavayê Kurdistanê çawa dinirxîni?

Mixabin tenê bi rêya kenalên televîzyonê em dikarin bişopînin. Ji ber ku li rojavayê welat şerek li dar e. Ez bawer im bernamêyên hunerî hinekî kêmtir in. Ez bi wê hêviyê me ku êdî kurd karibin akademyên beşên hunerê ava bikin û vî karî bi awayekî profesyonelî bigirin dest. Ji ber ku êdî ew derfet û delîve çêbûne. Li Bakur, mixabin, behêvîtiyek heye û çavên bakuriyan li Rojavayê ye. Rojava ne tenê ya rojavayîyan e; çavên hemû kurdan li Rojavayê ye.

Bi yek hevokê:
- Bi rêya hunera xwe, dixwazî çi peyamê bigihîni?
Hezkirin û azadî baş in; sipartin û nefret ne baş in.

- Herî zêde ji çi hez dikî?
Ji jiyane.

- Herî zêde ji çi aciz î?
Sipartin û desthilatdarî.

- Nirxê herî pîroz çi bo te çi ye?
Mafê jiyane, bi serbilindî.

- Eger di dunyayê de her tişt ji destên te bihatana, te yê herî pêşî çi bikira?
Xwezî bi wê cihana ku kesek nebe desthilatdar û mehkûmê kesekî.

- Di jiyana xwe ya hunerî de, tu li çi poşman bûyî?
Poşmaniyeke min a mezin tune ye.

- Qehremanê te kî ye?
Schopenhauer, Herakleitos, Nietzsche, Montaigne, Kafka, Camûs, Sartre, Baudrillard, Omer Xeyyam, Evdila Pêşew, Arjen Arî, Stendal, Doştovskî...
- Careke din sipas dikim.
Zor sipas bo we jî. Ji hemû dost û hevalan re silav û rêz.

Serpêhatî

Xulamê Zîrek



Dildarê Mîdî

Hatiye gotin ku di demekê de mîrekî ji mîrekên me, ji jineke bimêr hez kiribû. Eger wî (mîr) her kurtedemekê evîndara xwe nedîtiba, sebir û hedara wî nedihat û hal û wextê wî nedima.

Mîr jî ji agirê evîna di nava xwe de diqîçqîçî; hingî bêriya xemrevîna xwe kiribû û bi hesreta dîtina yara xwe bû.

Rabû xulamêkî xwe şiyand dî jinikê, da ku derd û daxwaza wî jê re bibêje.

Yê xulam di cî de rabû ser xwe û berê xwe da gundê "Awal" ku gundê jinikê bû. Ji wî re gotin: "Jinik ne li mal e, dibe ku ew çûbe gundê 'Ît'." Rabû çû gundê "Ît" pîrsa wê kir, lê li wir jî jê re gotin: "Wele ew li vir bû, lê serê wê sibehê çû gundê 'Bikat'."

Ewî berê xwe da gundê "Bikat", dît ku wa jinik ji wir ve tê. Xulam jê re got:

- Mîr li bendî te ye, çima tu li ser wî dereng mayî, ka tu yê kengî werî cem wî?

Jinikê got:

- Mêrê min ne li mal e, çûye êş, eger ew îşev were malê, helbet ez nikarim bême cem mîr; lê ku mêrê min veneger, bê guman ez sibe serê sibehê, mêvana mîr im.

Xulam vegehiya bal mîrê xwe, derbasî dîwanxaneyê bû, dît ku civata mîr hemî axa û kesayetên navdar in...

Hema di cihê xwe de raweştiya. Çawa ku çavên mîr bi xulê ketin, bi dest xwe re jê pîrsî:

- Ha... te çi kir?

Xulamê belengaz nikaribû li pêşiya wî xelkî rasterast bersiva mîr bide, lê jîrbûn û zîrekiya wî alîkariya wî kir ku bi vî rengê jêrîn bersiva mîr bide bê ku kesek ji civatê tiştêkî di meseleyê bigihe û zanibe çi heye.

Xulam got:

Mîr min;

Çûm "Awal" ne li mal

Çûme "Ît" min nedît

Çûm "Bikat" ji wê ve hat

Eger hat, nehat

Eger nehat, hat

Bi vî bersivê dilê mîr rûnişt û tu kesî ji civatê ji wan fam nekir.

Dibêjin mîr bi xulamê xwe kêfxweş bû û paşê ew xelat ji kir.

"Mihrecana Çîroka Kurdî ya Pêncemîn" Bi Dawî Bû "Mamoştê Jî Dişibin Hev" Xelata Fu'ad Temo Wergirt

Taybet - Bûyerpress

Di 13'yê tebaxa 2018'an de (roja inê) demjimêr 7'ê êvarê, bi tevlîbûna 13 çîroknivîsan, Yekîtiya Nivîskarên Kurd - Sûriye li navenda xwe ya li bajarê Qamişloyê, "Mihrecana Çîroka Kurdî ya Pêncemîn" li dar xist.

Çîroknivîsên beşdar, bi dirêjahiya 4 rojan û bi amadebûna nivîskar û rewşenbîran, nûnerên sazîyan û kesayetên deverê, çîroknivîsên xwendin û di roja pêncan de (07.08.2018) ahengek hat lidarxistin, tê de baştirîn çîroka "mihrecanê" hat destnîşankirin.

Roja Yekê

Di yekemîn roja "mihrecanê" de, Serokê Yekîtiya Nivîskarên Kurd - Sûriye "Dilawerê Zengî" deşpêbûna "mihrecanê" ragihand û li hemûyan pîroz kir, her wiha li ser pîvan û çawanîya nixandina çîrokan axivî.

Paşê çîroka "Du Serî di Beroşekê de Nakelîn" ji hêla çîroknivîs Dilovan Çeto ve û çîroka "Miri-na Boşka" ji hêla çîroknivîs Ebas Mûsa ve hatin xwendin.

Piştî xwendina çîrokan, kesên beşdar nihêrînan xwe der barê her du çîrokan de gotin û pîrsên ku hatin kirin, her du çîroknivîsan bersivandin.

Roja Duyan

Di 4'ê tebaxa 2018'an de (roja şemiyê), çalakiyên roja duyan a "mihrecanê", bi xwendina 4 çîrokan bi dawî bûn.

Çîroka "Çavên Kutkûti" ji hêla çîroknivîs Xalis Misewer ve, çîroka "Ker-Ga-Hesp" ji hêla çîroknivîs Selah Seyda ve, çîroka "Zimanê Rengîn" ji hêla çîroknivîs Ciwanê Evdal ve û çîroka çîroknivîs Ebas Ismayîl a bi navê "Qero Venegeriya Elî Fero" ji hêla nivîskar Zubêr Zeynal ve hatin xwendin.

Roja Sêyan

Êvara yekşemê, demjimêr 7'ê êvarê, bi amadebûna hejmarek ji nûnerên rêxistin û partiyên siyasî û nivîskarên deverê, "Mihrecana Çîroka Kurdî ya Pêncemîn" di roja sêyan de bi xwendina çar çîrokan bi rê ve çû.

Çîroknivîs Raman Hesê çîroka xwe ya bi navê "Dab" xwend, nivîskar Fehîm Morê çîroka çîroknivîs Ehmed Tahir a bi navê "Vira Salê" xwend, çîroknivîs

Çîroknivîsên "Mihrecana Çîroka Kurdî ya Pêncemîn"



Mihemed Pirê çîroka "Kum Tûtik" û çîroknivîs Taha Selîm çîroka "Pêlên Derya" xwendin.

Roj Çaran

Di çaremîn roja "mihrecanê" de (06.08.2018), çalakiyên xwendina çîrokan bi xwendina sê çîrokan bi dawî bûn.

Çîroka "Evin di Aşê Cengê de" ji hêla nivîskar Şevîn Hesen ve, çîroka "Demjimêr" ji hêla nivîskar Can Ibrahim ve û çîroka "Mamoştê ji Dişibin Hev" ji hêla nivîskar Qadir Egîd ve hatin xwendin.

Roja Pêncan - Roja Dawîn

Roja sêşemê (07.08.2018) demjimêr 7'ê êvarê, Yekîtiya Nivîskarên Kurd - Sûriye bi boneya bidawîbûna "mihrecanê" ahengek li dar xist, tê de çîroknivîsên ku beşdar bûbûn rêznameyên xwe wergirtin û çîroka "Mamoştê Ji Dişibin Hev" a çîroknivîs Qadir Egîd, baştirîn çîroka "mihrecanê" ji hêla "Komîteya Nixrandinê" ve hat destnîşankirin.

Di rê û resmî bidawîbûna "mihrecanê" de, çîroknivîs Qadir Egîd "Xelata Fu'ad Temo" ya "Mihrecana Çîroka Kurdî ya Pêncemîn" wergirt.

Di axaftineke xwe de ji Bûyerpressê re, Egîd got: "Çîroka min, çîroka her koçberêkî li welatê biyanîyê ye. Lehengê çîroka 'Qenco', nimûneya zarokên bêwar e ku

malbatên wan bi sedema şer li dunyayê derbider bûne."

Hêja ye mirov bi bîr bixe ku "Mihrecana Çîroka Kurdî" ji sala 2014'an ve bi serperêştîya Yekîtiya Nivîskarên Kurd - Sûriye, salane li Qamişloyê tê lidarxistin.

Parçeya dawîn a çîroka çîroknivîs Qadir Egîd a ku xelata baştirîn çîrok wergirt:

Mamoştê Ji Dişibin Hev

Qenco hindekî dî ber bi mamosteyê xwe ve çû û hindekî dî ji dilê xwe xurt kir ta ku jê re bibêje: "Ez Qenco me, ma tu min nas nakî? Tu li vir çi dikî?"

Û du benîştan ji bê pere bide wî. Lê destêkî mezin milê wî girt û ew bi paş ve vegehand; ew destê xwediyê xwaringehê bû!

Qotîka Qenco ji ser serê wî hate xwarê û şekirên wî li nav lingan û li bin maseyan belawela bûn. Qotîk bi çend libên ku tê de mabûn danî erdê û hewl da ku tiştên erda xwaringehê pê hate xemilandin, bide hev. Lê xwediyê destê mezin ew mîna qerpalekî bi dûv xwe de kişand û Qenco jî bi şewat û bê liberxwedan li şekir û benîştên ku li pey wî rêz dibûn dinêrî. Di dilê xwe de ji mamosteyê xwe xweşt ku bi gaziya wî ve were û wî ji destê vî zalimî xelas bike, lê hayê mamostê ji bayê felekê tunebû, bi hildana peyalan mijûl bû û dengê dilê Qenco qet nedikir.

Wek kêlikên kêfê ku zû derbas dibin, Qenco ji nişka ve xwe li derveyî deriyê xwaringehê, bi qotîkeke pelixî û vala re dît. A baş ku dem havîn bû.

Ji nû ve Qenco bi germa vî bajarî heşt bû, diwarê ku piştî xwe dabûyê, tev ku şev ber bi nêvî de ji diçû, lê hin sincirî ye û germa

deştîlanînê ketin, tenê xwe xistin hembêza hev û di quncika kon de bi dengê bilind giriyên. Dema ku dêya wan piştî çend rojan ji nexweşxaneyê vegehiya, ser çavên wê hemû sipî girêdayî bû û cîranên ku serdana wan dikirin, piştî ku radibûn, bi şewat li Qenco û birayê wî dinêrîn, deştên xwe li hev dixistin, û digotin:

"Weleed law... ev zarok dê çawa bikin?!"

Wê demê kela girî dikete qirika wan, bi çavêkî şikestî li çavên dêya xwe yên ku bi zorê di nav wê şaşa spî de xuya dikirin dinêrîn û dibû îske îska wan.

- Rabe Qenco rabe... rabe, çima tu se'et neh nehatî geracê? Ev saetek e ez li te digirim, ma tu nizanî niha erebeyên devera me nemane? Birayê wî Heso bi dengê bilind û kelogirî jê re got.

Qencoyê ku li devê deriyê xwaringehê xilmaş bûbû û mamosteyê wî ji çûbû malê bê ku Qenco wî bibîne û karibe du benîştan bidê, çeng bû û kertona xwe zevt girt.

Hesoyê dehsalî çavên xwe xistin çavê wî, bi hêz milê wî hejand û got:



erdê jî ne kêmtir bû.

Di kêlikekê de her tişt ji bîr kir û germîbûna konê wan dema ku bavê wî ji nexweşxaneyê anîn malê, çawa xwêdana wî bi ser birnê wî de diherikî û qîre qîra wî bilindtir dibû û xweşikbûna dêya wî berî ku rûyê wê bişewite, hatin bîra wî.

Ew jî di havîna par de bû, firavîn amade dikir, wî û birayê xwe, ji german xwe bi tena şortan kiribûn, dema ku ji nişka ve agir ji ser ta pê dêya wan girt, bavê wan ji li kar bû, ji tîrsa, ji

- Te dîs xewnên nexweş dîtine ne..!?

Bê ku Qenco bersivê bide, zendikê xwe bi xwêdana eniya xwe xist û ji birayê xwe pîrsî:

- Her dem dapîra min digot mirov dişibin hev, ma mamosta ji dişibin hev..!?

Hesoyê ku di pîrsa birayê xwe de negihaşt, tirabêlka rûyê wî ku tev li xwêdanê bûbû paqij kir û bi bêzarî û melûfî got:

- Xuya ye em ê îşev dîsan li bin pîrê derveyî Hewlêrê xew bikin birawo...

RÊZIMAN

Venerîneke Dîrokî Li Rewşa Zimanê Kurdî 6

Di reseniya zimanê Kurdî de gotina "mir" bi wateya "murx, teyr", bi du şeweyan teşeya xwe ya lêkdayî girtiye:

1- Mir + hişk= mirhişk (mirîşk)= murxê hişkayê.

2- Mir + aw, av= miraw (werdek)= murxê avê.

Em dizanin ku piştî deştîlanîtiya zimanê Pehlewî vekîşiya, zimanê Farisiya derî (Farisiya nû) şûna wî girt û bû zimanê çand û rewşenbîriya Îranî.

Têkiliya zimanê Farisiya nû bi zimanê Pehlewî re têkiliyeke pabendî ye. Çawa zimanê Pehlewî li ser kelaxê Parisiya Exmîni ava bûye, wilo jî Farisiya nû li ser kelaxê Pehlewî ava bûye.

Di vî latîka jêrîn de jî, hin ji nîşanên têkilî û bandora Pehlewî li Farisî û Kurdî ku bûye berçav dibin:

Table with 3 columns: Pehlewî, Farisî, Kurdî. Lists cognate words like Wefîl, berif, berif, befir; Pîtak, pîda, peyda; Mîtir, mîtroban, mihreban, mihrevan; etc.

Table with 3 columns: - Gef, gep, gef; - Nokroc, nûroz, nûroj, nûroz; - Giyan, can, can, giyan; etc.



Deham Ebdulfetah

Piştî vî ronîkirinê mirov digihêje baweriyeye kûr ku zimanê Kurdî yek ji komzimanên Hindo-Ewropî, malbata zimanên Îranî ye. Lê ji hêleke dîtir ve jî, zimanekî serbixwe ye, xwedan rêzik û deştûrên hûrbîn û taybet e.

Raşt e ku çî kar û xebatên pêdivî ji zimanê Kurdî re nebûne, lê li gel her rewş û delîveyê jî, dikaribû ji hezarên salan ve ta roja îro xwe biparêze!

1- Bêjeyên van her du latîkên çûyî, me ji gotara Hesên Qizilçî hilbijartine. Gotar di govara "Korî Zanyarî Kurd". Jimara (6)ê. Bexda (1978)ê de, bi navê "Goranî pitekan be yektir cêgorkêyî pitekan û siwa û teşkîkanî wuşekan be hoy ew alîgoraney be ser pitekan da dê" belav bûye.

Mamoştê Qizilçî jî, gotara xwe ji pirtûkeke Farisî, bi navê "Sebukînaşî" hilçiniye.

Helbestine Bijartî... Ciwanê Evdal

TEMENÊ ŞOL

Bibûre..
Ey temenê min î gijolî
Lê.. derbasî evîna min nebe
Bi kulleka biçûk hinakirî
Mîna fişek û gullê, di lûlê re
Û xunc û kulîlkên
Wê nequrmişine
An bi sol û potîneke çewt
Û dasek xêzkirî
Ew gava pêş li paş dikeve
Û diherbile
Kêlik û dem û roj tevî dem-
sala
Me dipêrgîne tenahiya xwe
Me davêje deryake bêbinî
Ji keyd û ûrîkirinê
Ji jibîrkirin û badîhewayê
Gelo.. tê çawa
Me biparêze ji zingara demê
Me bipêrgîne tenahiya Xwedê
Hey hê.. me veçirîne xewnên
belek
An dergehêk biçûk veke
Û me hinakirî bihêle
Ew bûyêrên bi alî me de
difirin
Du basikên ji şima ne
De em ê tariya sibehê verêsin
Bi wan pêlên me y nû
Yê gazî li pêlin din dikirin
Ku şevê veçirînin bi zorê
Bipijivînin ji elendeke
derengzayî
Ji zersora keskahiyê kevnar
Ku şiyar bikin elenda sar
..De bibûre ey çerxa çarqozî
Li temenê min î gijolî..
Hey loo.. hela hêdî bike
Gava xwe y çewt û dijwar
Li xewna min î zarokî
Li evîniya min î biçûkî
Li hêviya min î nazikî
Nede ber nifir û keviran
Û neke zivirî û dixsî û qayîş
Hey loo.. temenê gijolî
Hela hêdî bike pêga xwe y
çewt
Vegera berî em herin bê veger
Va ye em tene gasîna tewafê
Mixabin..
Hîna dergehên çak venebûne
An nebûye derengî demê
Derengî barbangê
Ey temenê min î gijolî.

TEWANÎ

Çi erzana bûye dil li cem te..?
Çi bêkêr bûye evîn li dil te..?
De ez ê çawa ji nûv de
Piştî keyd û dilmayiyê
Masiyên xwe y zêrîn
Bavêjim ava derya te y
qesagirtî
Ku melevaniya xwe bikin
De ez ê çawa kewên rengin
Li ezmanê te y mijgirtî ber-
dim
Bifirînim teqlan
An çawa stêrkên xwe y
biriqandî
Bavêjim şevbêrka ezmanê te
y tîsî
An tariya demûş û qirgirtî
De ez ê çawa beranê xwe y tî
An hespê xwe y birçî
Li çêra pirêza beyar biçêrînim
An ez ê çawa
Çûk û çivîkên xwe bilûsinim
Li ser şaxa dara te y tazî û
hişk
Yarê, va ez matmayî mame li
vir
Li kuçka çar riya
Û xaça fila li ser piştî min e
diyarî

..Û hîna dil qeşmûş negirtiye
Ku dûr e ji zayîna barbangê
ve..

NÊÇÎRVAN

Nêçîrvanan
Rav û awir û keser
Talan dikirin ber-bi-ber
Çi ye gunehê van armanca..?
Şîr didotin
Ji guhanên bedew çavên te
An hêsir û sozên germ
Bi derewa davêtin dû xwe dûr
Yarê.. li hember tîr û kevanan
Ya durîst çî ye bê guneh..
Bê şermî ev çî ye..?
Çima şaş e ev bûyer
Û ev raz û huner vajî ye..?
Dil û hunav li ber dikupine
Kî wê derman ke ji pêv te ..?
Ger ne bi awirêkî kuştî be
Kî wê term veşêre ji ber
xwe..?
Ger ne bi kalanê mirî be
Êdî ev e: Yasa nêçîr û ravê
De bera îşk û aho nebêjin :

Dixwaze li nav baxan seyran
bike
Ji ber taliya şevbêrkê nêzik
digrî
Demê firîna xwe basko kiriye
Pencê azariya xwe
dadiwerivîne
Ku hîna têr nebûye ji mişexti-
ya berê
**
..Ew kevok û perwanên
mêvan
Stêrkên pîkolîyê difirînin
sema
Gurzên kêfa lal dikine yek
Da ku berî şev kuta bibe û
vemre
Pêga wî yî rengin li dil bilu-
kume
Ah .. Û hîna bi ser xwe de
digrî
Ku têr nebûye ji cotkirina do
**
Ew dilê têr nebûyî ji ba û siyê
Ji mij û xunav û ahîna tîne
Xwe vedîçirîne şevbêrka

Ne yek û ne dido
Hezar û behtir ji wan.

RÊWIYO

Rê dûr e Rêwiyo
Û şev tarî û dijwar e
Stêr li ezmanê hêviyan pir in
Pir in û bê jimar in
Rawestan nîne
Vala ye
Hiç divê bigihên
Bi dema barbangê re
Tev de bi hev re deşt û soz
Ku li dar e
Ala hêviyan nû hilbûye
*
Bibûrîne sînoran
Sînor li dû sînoran
Xwe li ber te nagirin
Çavên te li jor
Singa te li ber
Pêşveçûnê
Pir pira û dîwar derbas kir
Xwe bigre
Rê dûr e heyva yekşevî
Û şev tarî ye



**Nivîskar Ciwanê Evdal, di baxê wêjeyê de pira-
niya celeban çêjaye û gelek babetên têvel şopan-
dine; helbest, çîrok, lêkolîn û deqên şanoyê bi
zimanên kurdî û erebî dinivîse, her wiha parçeyên
zargotinê berhev dike û ji zimanê erebî pirtûkan
li kurdî werdigerîne.**

**Ew di sala 1955'an de li Dirbêsiya Rojavayê
Kurdistanê hatiye dunyayê. Di dawiya salên
90'an de deşt bi nivîsînê kiriye û hetanî aniha hêj
berdewam e.**

**Hejmarek ji berhemên wî hatine çapkirin û belav
bûne û çend deşt nivîsên wî yên çapnekirî jî hene.
Di helbesta xwe de, nivîskar Ciwanê Evdal bi
nazdarî ji babetên evîne nêzik dibe û gelek
mijarên cihê, bi hûnandineke nûjen, di helbestên
xwe de bi cih dike.**



ÊLÎ YEMAN
Ber bi kû de diçe
Lîrandina minî tîr
Lorandina minî hev girti
- Êlî yeman
- Têlî tew tîlî
Heyfa mine
Tême şkenandin,
Wilo erzan ..
De ka bibin mêvanê sibê
Bigon bikin nivroja
Û ..
Stewr-bûna yekîtiya
Tiliyan vejînin,
Da perçebûnê hilçenînin
Ji darên çiya.
An pincarê xwe vedin
Xaka di dilê min de.
Bêjin bi min re :
- Êlî yeman
Ka em li ku man? ..

- Bo çî ye tîr û derd û birîn
Bo çî ne xem û xewn û xwîn
Bo çî ne ev biranîn ..?
Ew dilgirtin û hezkirina dîn...!!

ÊLÎ YEMAN

YEKÎTÎ
Ber bi kû ve diçe
Lîrandina min î tîr
Lorandina min î hev girtî?
- Êlî yeman
- Têlî tew tîlî
Heyfa min e
Tême şkenandin
Wilo erzan belav dibin
De ka bibin mêvanê sibê
Da ku bi gon bikin nivroja
Û .. Stewr-bûna yekîtiya
Tiliyan vejînin
Da perçebûnê hilçenînin
Ji darên çiya
An pincarê xwe vedin
Di xaka dilê min de.
* * *
Bêjin bi min re :
- Êlî yeman
Em jî neman..
.. jî neman.. jî neman..
.. jin neman.. ji neman.

ŞEVBERK

Şevbêrka me hatiye ber çinîne
Dîsa.. vê demsala heşîn
Bi biranînen hevirmêşî hişyar
bûye

kevnar
Û li ber tevna wê dimîne
hişyar
Da birêse careke dinê bi
firehî:
Vê.. vê demsala heşîn
Ku dîsa vê şevbêrka hatiye
ber çinîne
Vejîniya ji dema xwe y
westayî ve.

XWEDAKÎ

.. Ji nişka ve
Çivîkê evîne
Li ser şaxê dilê min danîne
Da bikin Yezdan û pêxemberî
Û hin perwanin rengin
Li dora revîna findê min
Disemiyar bi çepkan
Awir û ken û dilê tolaz
Digirînin li ser piyê şûva min
Û bi ewrê sipî xunavgirtî
dilîzin
Ku li qefa çewilîka dilê min
Bibarin ciwan
Ji berf û qeşa rût dipijivînin
Xunce-çiçekan cot
dipişkivînin
Ji riya kadiza bêqidoş
.. Ku ta nemîne bor û beyar
Ji ber xwe ve, lê şîn dihat zad
Helbet divê jî zexel û zîwan
- Ey temenê erzana dizê
Wiha.. bi evîna dupar azar
Ev dilê nazik û ciwan
Ji nû ve, xwe da ber daxan

Çîra.. çîrûskêk ji me xuya ye
Erê û erê.. ji me xuya bû
De bigihên berî dîsan..
Teşîya rojan vacî bigere
Yên di çaxê windayî de zayî
Tê bîra wî
Çawa dirêse tevna çewt
Gava çep digere
Kevir li ser kevir nahêle
*
Xwe ragire
Dem ji te re ye.. yê te ye
Û rawestan ji nîne
Hiç divê bigihên
Bi dema barbangê re
Tev de bi hev re deşt û doz
Ku li dar e
Ala hêviyan nû hilbûye
Ji mafê me ye pêş kevin
Û tu îşê kesekî pê tune ye
Rêwiyo
Dûr nîzik e
Pêga pêşîn, yê din dikişîne.

QAÇ Û XEYD

Çîma tu xeyidiye ji dilê xwe
Qey te qaça min kiriye
Û qaça mîna çiyakî
Li ber min û xwe daniye
Çî mû ye
Xwe li dilî gerandiye..?!!
Xwe li zimanî gernijandiye
Çîma ev şîrîyên beloq
Xunca me fetisandiye
Mîna pizoteke
Di nav arî de dikele vemirî

Nayê hilgirtin bipêjê deştan
Û dilê min û te li ser diqijqije
Ya raşt.. keyd bi me dikene
Û ez û te bi xweşî
Xwe li ber bayî nagirin şîpva
Dev lêvên xwe dikin
Çavên xwe dipeşînin nediyara
Û em dibêjin:
- Çîma û çîre û çilo ..?!!
Bo çî ye
Ev bilûra serhişkî
Li ber gayî
Bo çî ye ev serdana vajî..?
Ey surîşt:
- Ev dijî kê ye..?!!
Ger ne dijî min û te ye
Çîma ne mîna gul û bilibil
Asoyan zêft bikin
Û bi xunav û awazî
Bêjin: Bijî û her hebî
Qene dijî demê ye
Ji ber ne xema wî ye
Ew ji kîsê xwe naxwe
Her geroneka vajî ye..
Çendî hilma dengê me nake
Hewara me boş tê vexwarin
Li ber sirûd û sitranên xwe y
Şerpezekirî
Belê.. çawa zuha dibe .. ?
Ji emrê me dixwe û vedixwe
Bi qurtek av û bihneke ba
Û dilê lihevherbilî
Geh bi arê xwe ve xwe dişo
Û geh bi aramî..
An her gav û her çaxî dijî
Bê jimartina şahiyê.

Ji ber lehya Nûh li kopanê
Cûdî
Ramûsanek tenê
Rawestiyaye
Di serê girê dilê min de
Û di bal û bîra min de dibezê
An stêrek geş li riya kadizê
diçêre
Her tenha ya şevê sar e
Her dere dibe dermale
Cejna wê pîroz dikim
Li şûva genim û ceh û zîwana
Bûyera ji hev bêjîng dikim
Lê mixabin :
Tev ne yek serî û binî ne
Bi pirêza sala dirêsim
Çî nuh û kevnar
Yekemîn neqîşa qenewîçan
..Ramûsanek tenê
Di bal û bîra min de vedige-
vize
Li qunaxa dilgirtina cara
pêşîn
Bi nêçîra dilbijokiya xwe
dikevim
Û bi eşqa Aho û Îskan dibilim
Ji hev nikarim xwe bidêrim
Û hina, ji hina hilbijêrim
Ji derya xemên kevzekikirî
.. Zînhare rav û qeyd
Ku dermanekî çak nîne
Li cem Itar û Cadiwan
Ne weqî û ne batan
Ku kilit li cem yar ramîsan e
Û li cem yaro tune zeqnebut
.. Ramîsan jîn û jîyan e
Ew jehrek xweş e
Ramîsan siya Xwedan e
Li nav didiwan bi yek e
..Yê dilgirt bi maçekê ve
Ewî rahişte pizotek agirê şîn
Her tim birîna wê terr û şil e
Û derman bi ramîsanekê
Mîna agir bi agir vemirîne.

YEK RAMÎSAN

Yekemîn
Neqîşa qenewîçan
..Ramûsanek tenê
Di bal û bîra min de
Vedigevize
Mîna qafîkekî hezarsalî
Nav koma girê dilê min de
Li hev hatiye herî

Kultûrname

ZIMANÊ KURDÎ Û ZANIST 2



Zeynulabidin Zinar

Îcar ji bo ku dewlemendiya zimaneke bête zanîn û şaxên zaniştiyê pê bêne nivîsîn, divê ku wî zimani qalibê nişan, pîvan û kêşana xwe, li gor van çar xalên li jêrê wergeribe.

- Nişana Yekemîn a dewlemendiya zimaneke, divê ev hawe tê de hebin:

- 1- Dengsazî
2- Bêjesazî
3- Hevoksazî
4- Zaravasazî
5- Kêşesazî
6- Ferhengsazî
7- Watesazî
8- Rênivîs

9- Dîroka bingehîn a bêjeyan - Nişana Duyemîn a dewlemendiya zimaneke, ev e: Piraniya peyvên ku di zimên de hene, divê nav bin û ne ji kirin û rengan hatibin çêkirin.

- Nişana Sêyemîn a dewlemendiya zimaneke, ev e: Di zimên de peyvên hevwater hebin (sinonim).

- Nişana Çaremîn a dewlemendiya zimaneke, ev e: Divê zimani ji aliye daçekan ve xurt be.

Îcar li gor dîtin û peyîtdandina zanayên zaniştiyê, ev her çar xalên li jorê, di zimane kurdî/zaravayê kurmançî de hene û berhemên zaniştiyê pir bi hêsani ji pê tene/hatine nivîsîn.

Bê guman zimane kurdî di vî warî de pir dewlemend e heta ku pisporên zimani ên navnetewî ji jê re heyran mane. Wek mînak: Di 1994'an de, dema ku ew konferansa bi navê "Zimane Kurdî Ber bi Sala Duhezari ve" li Zanîngeha Sorbûnê (Paris) hate lidarxistin, ez bi xwe ji vexwendiyê wê bûm. Profesorekî fransî û yekî ingilîstanê, her yekî ji wan di axaftina xwe de weha got: "... Zimane kurdî di şaxê sewalvanî û çandiniyê de ji zimane ingilîzî jî û ji yê fransî jî dewlemendtir e..."

Dîsa ez wek lêkolînerê li ser folklorê kurdî û berhemên klasîk, di lêkolînan xwe de pêrgê pir tiştên dewlend bûme ku hem di folklorê kurdî de hene û hem di klasîkên kevnare de jî hatine bikaranîn.

Piraniya çîrokên folklorê kurdî, her yekê du û zêdetir şaxên wan hene. Wek mînak: Çîroka Gul û Sinem. Çî çîrokbêjê dema ku dev pê dike, pêşî weha dibêje: "Dibêjin, heft şaxên Çîroka Gul û Sinem hene. Lê ez tenê ji wan vê dizanim."

Îcar min di lêkolîna duwazdeh salan a folklorê kurdî de, çar şaxên çîroka Gul û Sinem bi dest xistinê û ew di cildekî de wek pirtûk dane çapkirin. Jixwe dewlemendiya peyv û bêjeyên kurdî, pir zêde ye. Berî 15 salan dema min dest bi xebata amadekirina ferhenga xwe ya bi navê FERHENGÊ BÊJEBÊJÊ kir, min bi awayekî pir zêde peyvên hevwater yên kurmançî dîtin ku ez bi xwe jî li dewlemendiya zimane kurdî şaş mam. Wek mînak, çewa ku min di çend semîneran de ji behs kiriyê, di kurdiya kurmançî de 16 navên sivnikê hene...

Pîrejina Kobanê 121 Sal Derbas Kirine Hêj Nexweş Nebûye



Li gundê "Girdê" yê girêdayî Kantona Kobanê, yek ji mezintirîn jinên dunyayê ku temenê wê 121 sal e, dijî. Pîrejina bi navê Eysê Baqî, di sala 1898'an de li Ruhaya Bakurê Kurdistanê ji dêya xwe bûye. 7 zarên wê hene; yê herî mezin temenê wî 85 sal e û yê herî biçûk 65 sal e. Li gorî ku zarên wê dibêjin, pîrê Eysê hêj nexweş neketiye û tendurîştîya wê gelekî baş e. Pîrê Eysê dibêje ku ew şahida Şoreşa Şêx Se'îd, Serhildana Dêrsimê, Komkujîya Ermeniyana û her du Cengên Cihanî ye. Her wiha hûrgiliyên awa û çawaniya avabûna Kobanê tenê bira wê. Li gorî gotina pîrê Eysê, bi saya jiyana gundîtiyê û xwarina rûnê malê, hingivê xwerû û hêk û penîrê malê, ewê kariyê tendurîştîya xwe ji nexweşiyên biparêze.

Kurdî Xweş e

Table with 4 columns: Bac, Kurdi, Deşte, Hîne. Rows include Rêdan, Çapkirin, Geşepêdan, Çarçove and their corresponding Kurdi terms.

Gotinên Pêşyan

- Tebax e, tirî raxe. - Ku te mar kuşt, serî lê bipelxine.
- Mirovê xerîb kor e. - Tiştê nedîtî nebêje!
- Jina malê, binyata malê. - Xwediyê lezê her poşman e.
- Gepa necûtî naçe xwarê. - Tovê belkiyê şin nabe.
- Hiş ne genim e ku bê pîvan. - Çemê mezin ji çiyayê bilind tê.

Xaçepirs

9x9 crossword puzzle grid with some cells filled with black squares.

Sitûnî

- 1- Mîfa, sûd (ji erebî) - Zeviyê ku tê avdan, ne bejî.
2- Hêmin.
3- Azad, serbest - Dijwateya "ere".
4- Firindeyêke dişibe qazan, miravî.
5- Hozêke (êl) devera Colemêrg û Behdînan.
6- Di lebat û tevgerê de, ava ku ji laşê mirov dertê - Nişana radyoyan (vajî).
7- Beyreq, sembola welatan - Hewlêr bi erebî + tîpa "e".
8- Dijwateya kevin - Welatê ku Bexda paytexta wê ye.
9- Cînavkeke pirjimar - Îro bi soranî.

ASOYÎ

- 1- Cihê firokeyan, metar.
2- Ji bêjeya "gir" du tîp - Pirjimarîya "ilm" (zanişt).
3- Hejmarek, di ser hejmara "deh"ê re.
4- Riştik, zêrê qirikê.
5- Etar, bêhînfiroş bi tirkî.
6- Agir - Hejmara "yazdeh"ê bi tirkî.
7- Ard - Cihê ku genimê lê tê hêran - Ev roj.
8- Cînavka şanidanê (pirjimar) - Raştîvîsîn bi erebî.
9- Bawerî - Xwendekarên medreseyan kurdî/islami.

Serpêhatiyên Kuran

Seydayê Tîrêj

Eliyê Remo, li Deştê Bişêriyê axayê eşîra Rema bû. Dibêjin ku tirkan fermana wî rakir, ji ber vê yekê berê xwe da Berya Mêrdînê û li gundekî wê bi cî bû. Kesekî Eliyê Remo nas nedikir.

Sibehan dihat odayê û li dawîya zilaman rûdînişt û carinan li ser enîşkan pal dida.

Sibehekê, Eliyê Remo li odayê, li hêla zilaman rûniştî ye. Gundîyan ji keyayê gund re got:

- Gavanê dewarê me derket û çû mala xwe, dewar bê gavan maye. Ka em çawa bikin?

Keye got:

- Ka em binêrin, belkî em ji xwe re gavanekî peyda bikin.

Keya zîvirî ser Eliyê Remo û jê re got:

- Bira, ma tu çi karî dikî?

Eliyê Remo got:


- Min hêj tu kar ji xwe re nedîtiye.

Keya gotê:

- Hema rabe here ber dewaran! Nanê xwe rojane bê minet bisitîne û serê dewar elbek genim û yeke ceh ji te re.

Eliyê Remo qîma xwe anî û ra-hîşt darê gavaniyê.

Rojekê dunya havîn e, kelke-la germê ye, Eliyê Remo darê wî di deştê wî de ye û dewaran dide hev da ku wan bibe



çêrê, dît ku şeş cendirme ji rêya bakur ve tîn û berê wan li wî gundî ye. Dema ku hatin gund, serekê cendirmeyan (onbaşî ye) bala xwe da ewî gavanî, nas kir ku Eliyê Remo ye. Ji hevalên xwe re got:

- Herin odayê, ez ê li dû we bêm.

Piştî hevalên wî çûn, onbaşî berê xwe da Eliyê Remo û li nik wî peya bû û silav dayê:

- Merheba Eliyê Remo!

Eliyê Remo lê vegeand:

- Ez benî, ez ne Eliyê Remo me; ez gavanê gund im.

- Elî ez qenc te nas dikim û min gelek caran nanê odeya te xwarîye. Netirse, em ne li te digerin.

Eliyê Remo got:

- Ya onbaşî, ez hêvîdar im tu ji kesî re nebêjî û bila kesek min nas neke.

Eliyê Remo dewar birin çolê û onbaşî çû odayê. Keya nanê wan çêkir. Dema ku nanê xwe xwarin û rabûn ser xwe ku herin, onbaşî di nav xwe û keya de got:

- Tu dizanî ku gavanê gundê we Eliyê Remo ye, axayê eşîra Rema ye!

Wê çaxê, xwîn di rûyê keya de nema, rabû bang li çend gundiyan kir û ji wan re got:

- Hûn dizanin ku gavanê me Eliyê Remo ye! De bilivin; em herin balê û xwe bavêjinê.

Eliyê Remo dît ku gundî û keya ji gund rêz bûn û berê xwe danê, nas kir ku onbaşî ji wan re gotiye. Keya û gundî gihan cem Eliyê Remo, keya serê xwe kir pêxa Eliyê Remo û giriya, got:

- Elî... ma çima te xwe bi me neda naskirin!?

Elî li ber dilê keya da û bi hev re vegehiyan gund. Wê rojê qedir û qîmetekî mezin dan Elî. Lê Eliyê Remo piştî ku ji odayê hat mal, ji jina xwe re got:

- Rabe em herin cihê xwe, çî dibê bela bibe.

Eliyê Remo vegehiya Deştê Bişêriyê. Li wê derê dewleta tirkan bi Eliyê Remo hesiya, dewletê ew girt û paşê ew kuşt.

Peyva Windayî Da ku tu peyva windayî bibînî, peyvên jêrîn xêz bike:

BALAFIR - BAR - KEZEB - XWENDIN - SÊWÎXANE - BÊWAR - RÊBEND - KESKESOR - ZEND - FENERXANE - ÇARÇOVE - RÊZNAME - ZER - GUR - KALAN - MERD.

Peyva windayî ji 5 tîpan pêk tê, ew jî navê gula nebişkuvî ye, bişkoj.

Word search grid with letters and some black squares.

Bersiva Xaçepirsa Hejmara Çuyî

9x9 crossword puzzle grid with some cells filled with black squares.